Hukûmeta Vîktorya nîşaneke (semboleke) nû heye bo alîkirina malbatên Vîktorya ku zarokxaneyekê bibînin. Jê re dibêjin Kinder Tick.

Hûn ê vê sembolê bibînin dema hûn werin nav avahiyeke zarokxane yan xizmeta zarokên temenbiçûk lê heye. Heye ku hûn vê sembolê li ser malpera wan jî bibînin.

Ev xizmetên baxçeyên zarokan bi rastî jibo perwerdeya zarokan grîng in.

Kinder Tick weha xuya dike.

KINDERGARTEN
Victorian Government Approved

Tîk wê wateyê dide ku hukûmeta Vîktorya pereyên wan xizmetan dide.

Zarokên we dê bi rêya lîstikan ji mamosteyên pispor fêr bibin.

Bo nimîne, ew fêrî tiştên derheqê zimên, jimaran û çînan de bibin. Ew ê fêr bibin çawa hevalan ji xwe re çêkin, tiştan parve bikin û guhdarîyê bikin. Ew ê her weha fêrî kiryarên din bibin ku dê bo amadekirina wan ji xwendegehê re alîgir bin.

Ji 2022 ve, zarokên Vîktorya dikarin du salan biçin baxçeyê zarokan pêş destpêkirina xwendegehê.

Bernameyeke baxçê zarokan dikare bibe beşekî ji lênihêrîna zarokan. Dikare herweha bernameyeke cuda be.

Di civaka xwe de (li herêma xwe) li nîşana Kinder Tick bigere. Ger pêdiviya te bi bêtir agahdarî hebû, bi mamosteyên baxçeyê zarokan re bipeyive.